

Lêveger çi ye û vegergeh çi ye?

Dilovanê Deştê
Nûşîn Bêcirmanî

" **Geh** ", di zimanê kurdî de, parkîtek e bi dawiya hin beşên bêjeyê ve dibe, da ku ew navdêreke lûsê saz bike, nimûne: lîzgeh, xwaringeh, wargeh..... . Herweku ji van nimûneyên jorîn tê xuyakirin, ku ew navdêrên lûsê dide nîşankirin. Lê ma gelo, ev parkît bi dawiya hemî bêjeyan ve dibe yan na ?.

Wekû em dizanin, di van çend salên dawî de têrma (**Lêvegera Kurdî**) ya ku Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) pêşinyara damezrandina wê di riya kongirekî netewî kurdî re kiribû, û li ber Hevbendîya Demokratîk a Kurd li Sûriyê danîbû, û bi vî awayî li ser erê bû. Gelo, ev têrmê durust e û wateya (**MERCÎ'İYÊ KURDÎYÊ**) dide yan jî têrma (**vegergeh**) weku mamoste R. Elî di weşana NEWROZ de hejmara 88/89 an di bin sernava (**lêveger an lê vegergeh?**) diyar dika!

Di rêzimana kurdî de parkîta (...**geh**) li dû navdêr û jêderan tê ; nimûne: dadgeh, firoşgeh, havîngeh.... Lê ev bêje bi lêkeran ve nabe. Ma dibe, em bêjin: kuştgeh, xwargeh... Ji alîkî din ve jî, dema têrma (**Lêvegera Kurdî**) hate bikaranîn, gelo mebest jê çi bû ?! endamên (**MERC'ÎYA KURDÎ**), yê xwedî pêşinyar, nerîn û biryar, ku bêne helbijartin di kongirekî netewî kurdî de, yan mebest jê, cihê ku ev endam lê bicivin û danûstandinê tê de bikin ? □ weku em dizanin Lêvegera Kurdî, ne cihê civat û civînên endama ye, lê belê, mebest jê endam û programên Lêvegerê ye. Eger mebest jê (**cih**) be, wê gelek(**Lêvegergeh**) hebin, îro li vir, sibe li wir û dusibe li cihekî din û her weha ta bêdawiyê. Ma dema em dibêjin

Perlemanê Kurdistanê biryar da gelo endamên Perlemento ev biryar dan, yan perlemangeha Kurdistanê ev biryar da?

Di jiyana de gelek cureyên lêvegeran hene, çunkî dibe ku kesek, komîtek yan jî saziyek bi xwe be. Tê gotin : Ev kesê ha lêvegereke olî, çandî, civakî,.... ye, û tê gotin jî ev sazî lêvegereke rêzîmên e, yan komîta ha lêvegerek e siyasî ye, ango lêveger dibe kes, komît yan jî saziyek be .

Li dawiyê, (**Lêvegera Kurdî**) têrmek e siyasî ye û wateya (**MERCÎ'İYÊ KURDÎ**) ta îro pêktîne. Lê di paşerojê de, heye ku bêjeyê din wê wateyê bi rengê durustîr bikar bîne. Lê tenê çi bêjeya ku (**geh**) yan jî (**cih**) bi dawiya wê vebe, ew wê wateya siyasî qet nade û wê nede jî.

Jiyan bi Kurdî xweş e Gotinek Hozanyarî kevnar dibêje :

Kavilê Xewnan

(Ji ber tu kanibî xwe di ser kort û keleman re bavêjî an gavkî, gerek berî her tiştî tu şûnda vegeerî). Herweha ,ta ku, em jî kanibin bêjin em Kurd in, pêwîste em berî her tiştî , li zimanê xwe vegeerin û xwe hînî xwendin û nivîsîna zimanê xwe bikin .Ji ber ku zimanê me hebûna me ye, û eger zimanê me tune bibe wê gavê em jî tune dibin . Lê mixabin, Kurdino îro pir ji me xort û keçên xwendekar di zanîngehan an di partiyan de hene bi zimanê xwe yê dê naxivin. Loma jî, girînge em ji vê xewa giran şiyar bin û hînî zimanê kurdî bibin . Keç û xortên Kurd ên çeleng û delal gereke dan û sitandina me Kurdan bi hev re bi kurdî be .

Girînge em rûmetê bidin zimanê xwe û ew têrmên Erebi û Turkî ji nav bêjeyên xwe ên zelal bavêjin û bi zarokê xwe re bi kurdî baxivin. Ji ber ku jiyana bi KURDÎ XWEŞ e.